



KURMANJI

Dêûbavên birêz

Divê em alîkariya hevdu bikin – Ev kare pêwîstî bi hewldanên hevbeş heye

Vê dawiyê hinek pevçûn di navbera komên sûcdar de pêkhatine. Tenê hejmareke biçûk ji ciwanan di vê pevçûnê de beşdar bûne, ku di bingehe de nakokiyek di nav komên mezinan de derketiye. Divê em berdeyam ciwanan ji pevçûnan dûr bînin. Ji bo vê yekê me pêwîstî bi alîkarî we heye. Wekî dêûbavê we derfetek heye ku bi zarokê xwe re li ser vê pirsgerêka ciddî bipeyivi. Li jêr tu dikarî çend şîretên baş li ser çawanîya bergirîkirina tevîbûna zarok û ciwanan ji nava ev pevçûne da, bixwîni.

Şêwirdariyek kêrhatî

Bi zarok/ ciwanê xwe liser ciddî bûna pevçûna dawî bipeyivin.

Ji tiştên ku zarok / ciwan di êvarê de liser mejûl dibin, balder bin - û kesên ku bi wan re di têkiliyê de ne.

Tu berpirsyarî, piştrast be ku zarok / ciwanê tê ji xelkê re acizî çê neke.

Eger tu wek dêûbav derbareya zarok û ciwanên din bifikarî, divê tu fikarên xwe ji xizmetên civakî re rabigehîni.

Eger pêwîstiya te bi şêwirdariyek zêdetir hebe, Ji kerema xwe gel xizmetên jêr pêwendiyê bigirin:

Xizmeta Şêwrê ji bo Ciwanên Bajarê Kopenhagê bi navnîşana: <https://ungeraadgivning.kk.dk/>

Ev xizmeta şêwirmendiyê ya belaş û nenas e ku ji bo ciwanên di navbera 12-18 salan û dêûbavên wan bedrest e.

“Hêla telefona komên suçdar”, Rêveberiya Polîsê Kopenhagen +45 93 50 00 12

Rêveberiya Polîsê hêlek telefonê xistiye ku bi vê hûn dikarin agahiyên li ser bûyeran û çalakîyên komên suçdar, ragehînin. Di rewşeke acîl de pêwîste herwisa gel hejmara 112 pêwendiyê bigirin. Di rewşên ku kêmtir acîl e, divê gel hejmara 114 pêwendiyê bigirin. Herwisa sepanek Rêveberiya Polîsan heye ku hûn dikarin bi rêya vê agahiyên / hişyariyan qeyd bikin.

Xizmetên 24 saetî di malpera <https://dognavgten.kk.dk/> An jî bi rêya telefona +45 33 17 33 33 berdestin.

Ev xizmeta 24- saetî ji bo her kesî ku tûşî pirsgerêkên civakî bûye û pêwîstî bi baldariya lezgîn heye, û ev xizmetene bi şev û roj vekirî e.

